

# Qonax bi Qonax Dirûvgirtina Kurmancî a Vegotinê<sup>1</sup>

Dilawer Zeraq\*

Ev nivîs; bi serlêdana qonaxên ku zaravaya Kurmancî a zimanê Kurdî tê re derbas bûye û di şert û mercên cihêreng de geşe di xwe daye, hewlê dide ku; veguherîn û geşedanên ku pêk hatine bi awirekî hevrûkirinê û di war û dîsîplînên wêjeyî –çi gotinkî, çi nivîskî- ên cihê cihê de darî çavan bike û panoramayeke giştî raxîne, da ku bibe pêşkêşiyek bo siberoja zimanê Kurdî (û bi taybetî zaravaya Kurmancî) û di warê aqûbet û çarenûsa wî de; û ji bo ku destkariya ku lê hatiye kirin (Elfabe û pirtûka Hînker a Cemiyeta Hêviyê-Amadekirina Gramera Kurmancî a Celadet A. Bedirxan) û destkariyên ku di roja îroyîn û di siberojê de lê tên kirin û dê lê bîn kirin, bibin sedem ku geşedanên zimanê Kurdî xurttir, berfirehtir, berbelavtir û qewîtir bibe.

## Di warê helbestê de:

### Qonaxa Klasîk:

Ku em tekstên nenivîsandî ên kilamên dengbêjîyê ji helbestan –mebest di biwara nûjen de helbesta nivîsandî ye- nehesibînin û wê bihêlin ji warê vegotina destan û meselan, -û em stranên gelêrî di nav qalibê çanda zargotinî de asê bikin- em ê karibin ji bo zimanê helbesta Kurdî a nivîsandî û ên li ser tekstan, rave bikin.

Ji bilî ku em meyl û bala xwe bibin ser pirska ka helbesta Kurdî a nivîskî bi

---

1- Ev nivîs, di panela ku ji bo roja zimanê Kurdî a li Bilgi Üniversitesi (Zankoya Bilgi-Stenbol) hatî lidarxistin de, hatiye derpêşkirin (16-05-2010).

\* Nivîskar

kijan şairê dest pê dike, em dikarin bêjin, -ji bili çarîn û şîrên Baba Tahirê Uryan- yek ji aliyê hevpar a xuyayî a helbesta Kurdî a klasîk, pirzimanî ye; mebest ji pirzimanî ew e ku şairên helbesta klasîk a Kurdî di helbestên xwe de, bi temamî peyv û qalibên zimanên wekî Farisî, Erebi û Kurdî bi kar anîne; mirov dikare wekî awarte ji bîne zimên ku hin şairên wekî Ehmedê Xanî di hin şîrên xwe de peyvên Tirkî bi kar anîne.

Her wiha, bi çi awayî dibe bila bibe, ji ber ku di wê serdemê de zimanê wêjeyê yê rojhilata navîn û Asyaya nêzik Farisî bû û zimanê Erebi jî di ser ola Îslamê re bandoreke xuya û xurt li ser zimanan dikir, di helbesta klasîk a Kurdî de jî zalbûna van her du zimanan xuya û dariçavan e.

Ji ber vê yekê, her çi qas em wan şairên xwe yekta bikin û wekî avangardên wêjeya bi Kurdî fam bikin jî, mirov nikare xwe ji vê rastiye bide alî ku; heta ku mirov hay ji zimanê Erebi û Farisî tunebe, têgihîştina wan şairan gelek zehmet e. Loma jî, her çi qas em xwe parîkî diêşînin da ku ji wan şairên xwe ên klasîk fam bikin jî, mirov nikare mandele bike ku ji sedsala 11. heta sedsala 20. di şîrên Kurdî de zimanekî nivîsandinê ku ji sê zimanan avabûyî hatiye bikaranîn; û ev yek ji aliyekî ve jî bûye sedema jevqutbûna çanda gelêrî û zimanê rojane û Kurdiya reş; û zimanê Kurdî a wê heyamê ji roja îroyîn zêdetir maye di navbera endamên çineke elit û bijarte de –endamên çîna rewşenbîriya Kurdî a wê heyamê ku ji şêx û mela û feqiyan pêk dihat û wan di medreseyan de bi sê zimanan, Erebi, Farisî û Kurdî, dixwendin- û civaka Kurdan her ji wê çaxê de durrî xwendewariya Kurdî maye û ev yek hê jî -çi ji ber sedemên siyasî, çi ji ber sedemên nebûna dewletekê, çi ji ber sedemên nebûna pergaleke ku perwerdeya bi Kurdî dimeşîne û çi ji ber xemsariya Kurdan a bo zimanê xwe- bi awayekî ji awayan bandora xwe dide ser zimên. Ez ê bo xweşikî danfêmkirina vê angaştê xwe serî li hin şair û şîrên klasîk bidim û çend malik û bendên wan wekî nimûne derpêş bikim.

### **Ji Mem û Zîn-Ehmedê Xanî (1651-1707)**

Mutleq tu mufid û mustefad î  
Bê şubhe murîd û hem murad î

Xanî ji kemalê bêkembali  
Meydana kemalê dîtî xalî (Xanî,2008)

*(Her tu yî sûdwer û sûdvergir î)*  
*(Bêguman evîndar û dilber î)*

*(Ne ku Xanî pir zana ye)*  
*(Lê wî dîtiye meydan vala ye)* (Xanî,2008)

### **Ji dîwana Melayê Cizîrî (1570-1640)**

Her seher dinêrim ez cana bi ahan ra ji dil  
Bareke-l Barî bi is'adîn 'eleyha yewme 'îd  
(Cizîrî,1992)

**Ji dîwana Feqiyê Teyran**

Cezbe çi remzek cefî ye  
 Mebde 'çî halek xafî ye  
 Têtin bi dil da tavî ye  
 Mewcê di behra hikmetê (Teyran,2009)  
 Dîgel van yekan, gelek balkêş e ku şairên helbesta klasîk a Kurdî, -kî dizane belkî ji ber hişkî û rîknokîya Kurd(î)bûnê ye- di hin malîk û beşên helbestan de Kurdiyeke xwerû û sade bi kar anîye.

**Ji Ehmedê Xanî**

Wî bêdîlî her li wê mekan girt  
 Wî bilbilî bo xwe aşîyan (hêlîn) girt

Vêk ra werîyan li wî per û bal  
 Têk da weşîyan ji wî xet û xal  
 (Xanî,2008)

**Ji Melayê Cizîrî**

Şox û şengê zuhre rengê  
 Dil ji min bir dil ji min  
 Awirê heybetpilingê  
 Dil ji min bir dil ji min

Wê şepalê misk î xalî  
 Dêmdûrê gerdenşepalê  
 Cehbeta bîskan şemalê  
 Dil ji min bir dil ji min  
 (Cizîrî,1992)

**Ji Feqiyê Teyran**

Nobedarê kelchê xwe  
 Dergevanê dergehê xwe  
 Bîne bîr û agehê xwe  
 Tûleyê asîtan im ez  
 (Teyran,2009)

**Qonaxa Hawarê anku destpêkirina tevgera nûjenîya wêjeya Kurdî:**

Di destpêka salên 1900'î de, ronakbîriya Kurd li Stenbolê teqlekê dide xwe û ligel avakirina komele û cemiyetêke rewşenbîriya Kurdan û weşandina kovareke wêjeyî (Rojî Kurd), balê dibe ser netewebûna Kurdan û bandor û girîngiya wê a di vê avabûnê de. Min divê hem peytekê bikim hem jî bidim zanîn ku; Kovara Hawarê berî her tiştî *tevgereke zimani*; *tevgereke teqldayîna li zimên* bû. Loma jî, gava em li nivîsên di kovarê de, li sekn û helwest û awayê bikaranîna zimên ê nivîskarên dinêrin, serê pêşîn ev rewş derdikeve holê; *behwêstên velqutandina zimên û bewldanên avakirina netewebûna Kurdan*. Vê rewşê bala me dibe ser taybetiya çînî, çandî û entelektuelî a danêr û nivîskarên wê

qonaxê ku; avakarên sereke Celadet Alî Bedirxan û Kamûran Alî Bedirxan, endamên çîna serdest a Kurdan (mîrektî) bûn; û tevî ku Mala Bedirxaniyan ji eşîreke mezin û fireh pêk dihat ji, ji salên 1800'î û şûnde di warê netewebûna Kurdan de bi roleke avakar rabûbûn; û ev rabûn û hewldan di Qonaxa Hawarê de bi du endamên Mala Bedirxaniyan bi gîştî li ser 'avakirin û peydekirina hişkî neteweyî a di ser çand û zimên re' hê bêtir û xweştir darî çavan bû.

Loma ji piştî sala 1930'yî bi qonaxa Hawarê re, wêjeya Kurdî, bêtir bi wêjeya cihanê re têkildar dibe, car di geş dibe, bi helbestên helbestkarên mîna C.A.Bedirxan, Cegerxwîn, Reşîdê Kurd, Qedrican û ên di, helbesta Kurdî ji zimanên Farişî û Erebi dûr dikeve, ev wêjekar di berhemên xwe de teqleke dîtir li zimên didin; zimanê nivîsandinê hê bêtir nêzî Kurdiya reş e û êdî metafor, hêma û temayên vegotinê li ser watedariya peyvên zimanê Kurdî ên xweser û xwerû û li ser kelepûra Kurdî ku ji mitos, destan, bûyerên dirokî, çirokên gelêrî û çanda xweser pêk tê, tên sazîkirin û avakirin. Û zimanê Kurdî li şûna ku bi zimanên wek Farişî û Erebi bidebire, ji çand û zimanê adetî ê ku gel pê diaxive, didebire. Loma jî di berhemên nivîskarên vê qonaxê de, ziman bêtir nêzîkî gel e û li ser hevoksazî û watebariya xwe radibe.

### Çend mînakên ji helbesta vê heyamê: Ji Reşîdê Kurd

Nalî pîrsî  
 Hingiv kîngê peyda bû  
 Mem û Zînê bi hev re gotin  
 Hingiv ew roj peyda bû  
 Ku şanî devên du evîndaran  
 Mêşhingivên maçê xwedî kirin û  
 Ji gund şandin bajêr  
 (Kurd, 1995)

### Ji Cegerxwîn

Keko ez zimandirêj im  
 Mexeyide ez çi bêjim  
 Ez xêrxwaz û dilovan  
 Bêtoz û bêqirêj im

Zimanê min û te ye  
 Nîsk û genim û ce ye  
 Gelek ziwan tê de ye  
 Niha jê re wer bêjim  
 (Cegerxwîn, 2006)

### Ji C.A. Bedirxan

Bilûra min a şîrîn  
 Tu di sariya sibehê  
 Û hingura êvarê de  
 Hevalê bêhevalan

Destbirayê şivan û dilketiyan î.  
 Dengê te  
 Hestirên dilê xemgîran  
 Silava jihevveqetiyan  
 Girîn û zarîna dilketiyan  
 Tîne bîra min  
 Bilûra min tu î,  
 Xemrevîna terkeseerên dinayê!  
 (Hawar,1998)

### **Dema Kovara Tîrêjê:**

Helbestkarên ku di kovara Tîrêjê de nivîsandin, teqleke dîtir –ku bi taybetî di helbesta Cegerxwîn de kêma mabû- dan helbesta Kurdî. Ji ber ku şêweya bikaranîna nîşane û diyardeyên politîk ên di helbesta Cegerxwîn de, pir zêde beloq û rasterast bûn. Lewre jî di helbesta şairên vê heyamê de, hem îdeolojî, hem jî siyaset li ser zimên û dîroka Kurdan û bi awayekî hêmayî û metaforîk –ku ev yek di Cegerxwîn de kêma mabû û bi temami negihîştibû hemde xwedihate zimên. Û mirov dikare bêje ku; helbestkarên dema Tîrêjê, bûn pireke xweser a di pevçandina Qonaxa Hawarê û nivîskariya Kurdî a li Dîasporayê û nivîskarên Nîfşên Rewşenê de.

### **Çend mînakên ji helbesta vê heyamê:**

#### **Ji Rojen Barnas**

Mîna navê xwe kola li bircên Diyarbekirê  
 Gava ku stêrk li ezmanê stûxwar  
 Gava ku ney û bilûr û tembûr  
 Û dahol û zirne  
 Sar bûn, sar bûn

Ez welatparêz im,  
 Ez mirovperwer im,  
 Ez Bavê Tûjo me lo!...  
 Şoreşger im Şoreşger im

Mîna navê xwe kola li bircên Diyarbekir.  
 Ez Şêx Seîde kal,  
 Bijîşk Fuad im  
 Pêşmergekî bê nav û bê nîşan  
 Ez duh şehîd bûm  
 Îro, nûhat im.  
 (Barnas,2002)

#### **Ji Arjen Arî**

Di qada şer de piştta me negihîst erde  
 Te şahid bivê, va Herekol

Miradkar, bi bext û ol  
Ca Cûdî  
Û va ye ev ax!

Kîj wextî bêleheng ma?  
Kî gavê bêkêr?  
Ev axa bi xêr û bêr  
Ji bakur ve serejêr  
Gebar  
Sîmal  
Bêxêr  
Her yek şêrko  
Ango  
Yek yek Êzdîşêr

(Arî, 2002)

### **Ji Berken Bereh**

Feleka xayîn  
Ji xelkê re şîr û mast  
Ji me re êş û jan  
Xem û kul  
Didoşe.

Ka bêje  
Ey feleka xayîn  
Qelenê te  
Çend quriş in?

(Bereh, 2006)

### **Heyama wêjeya Kurdî a li Dîasporayê**

Piştî salên 1975'an –bi taybetî piştî salên 1980'yî- Kurdên ku ji ber xebat û nasnava xwe a polîtîk berê xwe didin welatên Ewrûpayê, dest diavêjin pênûsa Kurdî û bi taybetî li Swêdê wêjeyeke sirguniyê, wêjeya dîasporayê tê afirandin.

Mîrov dikare bêje, di xebatên zimanî û wêjeyî ên di navbera salên 1975 û 1995'an a li Ewrûpayê (bi taybetî li Swêdê) hatî kirin de, bo nivîskariya Kurdî hewldaneke baş heye û zimanê Kurdî parîkî di jî nêzî xwe dibe.

### **Çend mînakên ji helbesta vê heyamê:**

#### **Ji Ehmedê Huseynî**

Agirê me  
Ferhenga çiyayan bû  
Wexta ku agir ji me xeyidî  
Ferheng jî

Li goristaneke bêkêl  
Hate veşartin

(Huseynî, 2002)

### **Qonaxa Nifşê Rewşenê anku dûrketina ji çanda kevneşopa kambax a nivîsandina bi zimanê biyan:**

Piştî salên 1990'î helbesta Kurdî berê şîpa xwe berpêyî nûjeniyêke dîtir ve kir û hê bêtir bi bandora helbesta serbest a rojavayî hate nivîsandin. Her wiha, ziman û bikaranîna wî ya bi awayekî dî, watedarkirina peyvan a li ser çanda gelêrî û gerdîşî û ezmûneyî û dîrokî, pêk hat. Helbestkarên Nifşê Rewşenê, di ser paşxaneyê wêjeyêke ku hê avakirina gewdeya wê nehatiye tevakirin û di ser paşxaneyê xurt a helbesta nivîskî û çapkîrî re dest bi nivîsandinê kir. Nivîskarên vî nifşî, ew nivîskar bûn ku; her yek kêmtirîn bi zimanekî dî –wekî Tirkî, Îngilîzî, Frensî,- jî dizanibû û di warê xwîneriyê de zanîna xwe a ji zimanên dî, (bi taybetî bi zimanê Tirkî) li xwe kirin avantajêke mezin; loma jî, her yekî/ê ligel çand û zimanê Kurdî, çand û zimanê neteweyên dî jî, ji derveyî û ji wêdetirê şêwedari û dirûvgirtina polîtîk hildan dest; dan dû dilkêşîya xweserîya zimanan û hewl dan ku di wargeha zimanê xwe de jî bibin ferdek; û wan wekî mêşhingivan ji hemû devok û şêwezarên Kurdî tehm û çêj girtin û ew çêj tev li helbestên xwe kirin. Lewma jî, wan karî têkiliyên baş û xurt bi wêjeyên zimanên dîtir re jî deynin.

### **Çend mînakên ji helbesta vê heyamê:**

#### **Ji Îrfan Amîda**

Di kêlika baneşanekê de pirtûkek dihat nivîsandin  
Di tehma ên berê de  
Ên ku têra xwe Xwedê tê de  
Ev dev tehmax  
Piştî min kelax

Piştî min kelax  
Dûmahîka bersivên nedayî me  
Dema ku bersiv bêne dayîn  
Ez ê bimirim ji zimanê xwe  
(Amîda, 2005)

Di vê helbestê de tiştê ku bala me diçe ser ev e: tevî ku 'ax' di zimanê Kurdî de ne paşgir e jî, helbestkar ew ji bo avakirina rîtmîla hilkutek a hundirîn a helbestê wekî paşgir bi kar aniyê.

#### **Ji Lal Laleş**

Med ji hespê hezkirina wan hez kirin  
Wan em ji zêrzemîna zêmara me kirin  
Hespa Şê binefşê  
Biborîne!

Me bi destê xwe hûn xistin erebeya şer...

(Laleş, 2009)

Di vê helbestê de, bi teknîka alîterasyonê, kitên (heceyên) 'he' û 'ze' 'se' bo avakirina hevkeşe û hevgeriya rîtmî helbestê, hatiye bikaranîn.

### Ji Kawa Nemir

Siyeke mirî. Bi hesabê rîman dikişe, li ser darê lîngan wekî gincirekî dilolije. Li wir, di nava gonîyan de digevize aramiya wê. Kerî xwe berdide kûrkê. Bîranî pal didin li bîniya gund. Goristan. Siyêke mirî; siya şevîna bêxew û westiyayî. (Dûr, 2006)

Di vê helbestê de em rastî teknîka 'peşanhelbestê' tî ku piştî bikaranîna zimên a bi şewê û awayên dîtir û dirûvdayîna wî, di wêjeyê de ava bûye. Û helbet, helbestkarî dikaribû hemû rist li bin hev binivîsandîna û teşeya klasîk a helbestê bi kar bîniya. Lê li vir, hem hewldaneke zîmanî heye hem jî hêçandîna teknîkeke dîtir a helbestê heye; ku her du jî ancax bi hişmendîya zimên dikare pêk bê.

### Di warê çîrok û vegotina peşanî de:

#### Kilamên Dengbêjiyê:

Ger em kilamên dengbêjan wekî mînakeke vegotîna destanî a mesel û çîrokan hîlbijêrin û bihesibînin, em ê karibin bêjin, yekem vegotînen peşanî a çîrokî—ku li ser kaxiz nehatine dariştin—kilamên dengbêjiyê ne.

Di van kilaman de, zîman ne armançeke esasî ye, lê belê ji bo anînzîmana mebestê alavek e; loma jî, gava mirov bala xwe didê, tê dîtî ku; tevî ku zîmanê ku tê bikaranîn, xwerû, fesîh, sade û petî ye jî, ji bo bicîhatîna armançê û ji bo danfêmkirîna bûyer û çîrokê, carinan qaydeyên zimên bi awayekî pratîk tê pêpeskirin. Lê ev yek wîsan bi nermahî û xweşikî tê kirin ku mirov dibêje qey ji bo vegotîna çîrokê û famkirîna jê, ev rê rêyeke bivênevê ye. Her wiha, di kilamên dengbêjiyê de, biwêj û qalibên Kurdî bi awayekî pir xweş û di cî de hatine bikaranîn.

### Ji devê Huseynê Farê

#### Kilama HAY LÊ GULÊ

.....

.....

Mi di Gulê vê sibê bi sê denga dikir gazî digo; lo lo lawîko mehrûmo,

**min ê** vê sibê cilê delalîkê xwe **tevnaye tev pêçaye**

.....

Erê heylê dayê **min ê berê xwe daye** ser ava çemê Diyarbekir, w'ez ê gava diçûm ser ava Feratê Diyarbekir, wele **min ê bala xwe dayê** şopa qantirçiyê Sêrtiya bû, guherê miya bû, mexelê boşî deva bû...

Gava mirov bala xwe didê, dibîne ku, li dû cînavê qertafa dema bê 'ê' tê bikaranîn, lê lêker bi demên borî tîndarîşandin. Lewre jî, mirov dikare bêje, li vir rîtm û lezî û newaya vegotinê girîng e ji bikaranîna rast a zimên. (*Şaredariya Mezîin a Amedê, 2007:134*)

## Ji Karapetê Xaço

### Lawikê Metîni

Lê lê dayikê heyranê de tu rabe  
Bi xwe ke bi Xwedê ke roja şemiyê  
Serê min bişo û xemla min li min bike...  
Bisk û tev morîkan li ber enîka min çêke  
Hey lê lê... lê lê hey delalê

.....

.....

Herke **tê min dixwaze** bila bê min bixwaze  
Herke **tê min direvîne** bila bê min birevîne  
Herke min narevîne sibê min bi rê kin  
Hey lê lê... lê lê hey delalê

(*Şaredariya Mezîin a Amedê, 2007:152*)

**Çîrokên Gelêrî:** Di çîrokên gelêrî de, zimanekî, heta tu bêjî sade, fesîh, xwerû û zimanê rojane a axaftin û jihevfamkirinê hatiye bikaranîn. Her wekî kilamên dengbêjîyê, di çîrokên gelêrî de jî, armanca sereke danfêmkirina bûyer û çîrokê ye. Her çî qas, bi taybetî di warê bikaranîna daçekan û di warê zayenda navdêran de, aloziyek hebe jî, em dikarin bêjin, ji aliyê gramerê ve pir zêde û bi awayekî beloq şaşîti tune ye. Û dema em ji aliyê bikaranîna peyvên ve jî bala xwe didîne, em dibînin ku her çî qas di hin çîrokên de peyvên ji zimanên di hatine bikaranîn jî, ev yek zêdetir ji ber ku ew peyv di jiyana rojane de bi awayekî aktîv hatine û tîndarîşandin, qewimiye.

Li vê derê, hêlêke girîng heye ji bo jêveqetandina zimanê nivîskî û zimanê gotinkî (wêjeya honakî û wêjeya gelêrî): Di zimanê çîrokên gelêrî û kilamên dengbêjîyê de 'demên hevedanî û girîft' ligel hev û di nav hevokekê de nayên bikaranîn; ji ber vê yekê di vegotinê de gihanek zêdenayên bikaranîn û bi rola xwe ranabin.

Zimanê vegotinê ê çîrokên gelêrî, zimanê rojane û axaftinê a jihevfamkirinê ye. Her wiha, yek ji taybetiya çîrokên gelêrî ew e ku ji ber taybetiyên xwe yê anonîmî, gelek guherto û versiyonên wan peyde bûne û hemû versiyon jî li gorî devoka herêman hatine gotin û di çîrokên gelêrî de jî, biwêj, carinan gotinên pêşyan û qalibên Kurdî pir baş û bi xurtî hatine bikaranîn.

## Ji çîroka Siyabend û Xecê

.....

.....

Siyabend got: "Bira **ya hate serê min, nehatye serê gurên çîyan**. Ez piçûk

bûm, dê û bavê min, xûşk û birayên min gişk mirin, ez **ketim ber destê** ap û amojnê. Wana zulmeke bêhed û hesab li min kirin. Ez ji destê wan revyam, **ketim çol û deştan**. Paşê Xudê ez ji tengasyê xilas kirim, ez **hatim ser vê kemplê...**”

Qedê dest pê kir û got: “Bira çîroka min ji dût û dirêj e, ez bi kurtî te ra bêjim. Ez bi xwe Şikakî me. Mala min li Berya Şikaka bû. Axakî êla me hebû, merivekî pir xayîn û bêbext bû. Li pêşiya wî kesî nikaribû **serê xwe bilind bikira**. Yekî ku hinekî **av lê germ bibûya**, xelkê jê hez bikira **xwe pê bigirta**, ewî **bi dek û dolaba tiştêk danî serî...**”(Aras, 1993)

### Ji çîroka Mîrze Mihemed

Hebû padşak, du hev kurê padişe hebûn. Navê yekî Mîrze Mihemed bû, navê yekî Elî bû. Padişa qet **rû nedida** Mîrze Mihemed. Rojekî Mîrze Mihemed diponije û divê. Qet rûmeta min li cem bavê min tune. Rabû hespê bavê xwe yê Behrî siyar bû. Ji mal derket. **Terkedunya bû** çû.

.....

.....

Miheme Mîrze go:

- Ez hatime ko we ji vê derê xilas kim. Bê xilaskirina we, cîkî da jî naçim. Qîzîkê tîne bin bîrê da û gazî dike. (Îşler, 1998:111)

### Ji çîroka Tembûrzêrîn û Tembûrzîvîn

**Go** şeş bira bûn. Çûne seydê. Diya wan nexweş bû. **Go**:

- Day ku qîz bû. Teşiyê bi ser derî da ke. Ku law bû. Şûr bi ser derî dake. Em diçine seydê. **Go** çûne seydê. **Go** Xwedê da diya wan qîzkî. Ji kêfana şûr bir û çû. Serî derî da kir. **Go** birê xu yê piçûg şiyandin. **Go**:
- Ca here mêze ke, dayê çi kiriye? **Go** gava hat. Mêze kir şûr ser derî da ye. Çû ji birê xu ra go:
- Wele şûr.
- Ooo, ge em şeş mêr in. Viya zî bû heft. (Akyol: 83)

-Di vê çîroka Tembûrzêrîn û Tembûrzîvîn de, vegotina çîrokê bi devê kesekî di hatiye kirin ku ev teknik hem di wêjeya modern de ciyê xwe heye û hem jî taybetiyeke berbelav a vegotina çîrokên gelêrî a Kurdî ye. Ku em ji bo baş têgihîştinê bala xwe bidinê, em ê bibînin ku vebêjer hem bi xwe çîrokê û bûyerê vedibêje hem jî, berî vegotina xwe bi gotina peyva 'Go' mîna ku yekî jê re gotiye—an jî wî ji devan hildaye- û ew jî vediguhêzîne me, tîne zimên.

### Çîrokên Fabl:

Di çîrokên Fablê de jî ziman ji hemû aliyan ve li ser dirûvê zimanê çîrokên gelêrî ye. Û di van cure vegotinan de jî, armanc ne ziman e, raguheztina fikr û naveroka çîrokê ye. Û di fablên Kurdî de jî, ziman bi temamî ji vegotina Kurdiya reş e û pir fesih û rewan e.

**Fîl û Çûk**

Hewîngehekê de filek hebû. Ji ber vê filê kesan nedikaribû têkevin wê hewîngê de. Dema fil tîhn dibû diçû li ser bêrmê av vedixwar. Di kêleka bêrmê de darek hebû. Çûkek ji li ser vê darê hêlîna xwe çêkiribû. Dame laşê fil dixuriya filê laşê xwe bi darê ve tanî û dixurand.

.....  
 .....

(Sağrıç,1998)

**Çîrokên nivîsandî ên honakî û wêjeyî:**

**a) Qonaxa Hawarê:** Bi derçûna Kovara Hawarê re, wêje û toreya Kurdî kirasekî di li xwe kir û heta roja îroyîn dirûveki dîtir da xwe û ev hewla dirûvgirtin û dirûvdayînê hê ji didome.

Di Kovara Hawarê de, her çi qas hin jê bi mebesta mesajdayînê hatibin nivîsandin ji, hejmarek çîrok û pexşanên ku bi honakên gelek xurt û qewî û rûniştî hatine nivîsandin. Ev yek ji bûye sedema jevqetîna (an ji jevqetandina) çîrokên gelêrî û çîrokên nivîsandî (ên honakî). Û mirov dikare vê serdemê wekî destpêka mezintirîn teqldayîna zimanê Kurdî bihesibîne.

Di van çîrokên de, tevî ku zimanekî xwerû, fesîh, sade û li ser hîmê zimanê axaftinê hatiye bikaranîn ji, hevokên dirêjtir hatine nivîsandin, gihanek ji bo xurtkirina vegotinê û pevgerêdana hevokan hatine bikaranîn, daçek bi xurtî û di ciyê xwe de û rast hatine bikaranîn.

Vegotin, ne di ser bûyerê, lê di ser zimên re hatiye kirin; û vê yekê ji kiriye ku ziman derkeve pêş û di vegotinê de nebe alaveke çîrok û bûyerê; û bibe yek ji hêmana sereke a vegotinê. Her wiha, mirov dikare bêje, diyalog û monologên ku –ne li ser bûyerê lê belê li ser vegotinê- hatine avakirin ji yekem car di van tekstan de tînin dîtî.

**Ji çîroka Gazinca Xeçera Min**

Ji zû ve ye min lê nenihêrtibû. Di ser banê kitêbxana min re; di quncikeke tarî û bi toz de tanişkî û xwêl hilawistî bû.

.....  
 .....

Berî çend rojan qelema min keh bûbû. Min ê ew tûj bikira. Li kêrika xwe geriyam **ku** bikare qelema min tûj bike. Çavê min bi xencerê ket. Rabûm ber bi wê ve çûm. **Wekî** min destê xwe lê dirêj kir, pîrhevokên dorê bi min, bi biyanekî hisiyar, lingên xwe yên kevcalin di ber serên xwe re borandin û her yekî bi alikî ve baz da. (Bedirxan, 2007)

**Ji çîroka Gulê**

Wê şevê Gulê dîsan digirî, **lê** îcar ne ji êşa tjangiya Qoço ve **ku** wekî marekî xwe li bejna wê ya zirav radipêçand. Xew, qet nediket çavên wê. Dijmin dê

biketa welêt...

.....  
.....

Li çareya xelabûnê digeriya. Diviyabû **ku** gundê xwe, welatê xwe, çiyayê xwe **û** serbestiya pilingê xwe “Pola” ji dijmin biparêze. (Zaza, 2007)

### Ji çîroka Leylana Rastiyê

.....  
.....

Birîndar, li birînên xwe dinêrin; dibînin birîna wan goşt girîye. Dê li zaroyên xwe mêze dikin **û** dibînin **ku** êdî rûyên wan ter **û** teze ne; **ne** zer in **û** **ne** bi hêsir in, hinarikên rûyên wan weke gul **û** gulnexwînan sor in. (Bedirxan, 2007)

### Ji çîroka Guneh

Carekê min di kitêbekê de xwendibû: “Serhatiyên meriv **çi qas** kevnar be, di mêjiyê meriv de **ew qas** şopên kûr dihêle...”

Rast jî wisan e; tiştên **ku** min di piçûkiya xwe de dîtine, serhatiyên wê gavê îro pir qenc, gelek bi zelalî tîn bîra min. Lê tiştên hene **ku** duh, pêr min dîtine; **an** bihîstine, **an jî** hatine serê min bi xwe, îro zû bi zû nayên hişê min... (Can, 2007)

Di van her çar çîrokan de, gihanek ne tenê ji bo pevgihandina du hevokan, lê belê ji bo berdewamiya vegotinê û ji bo avakirina hevokên dirêj ên ku hevoka beriya xwe watedar dikin, hatine bikaranîn.

### Ji çîroka Kor

- Sûcê Seyda bû belkî camêr tişteke bida me?
- Seyda bi zor ji xwe re bixwazî?
- Rast e rast e, tu malê vî qasî welatî têxî dawa wî nabê na.
- De hema bere ew têr bî û em birçî bin.
- Oh... pa bere sed carî em ji birçîna bimirin, jixwe belkî niha para me jî xwariye.
- Ma kî zani? Tim dibên elif û bê?

.....  
.....

(Cegerxwîn, 2007)

Hêjayî gotinê ye ku ev çîrok bi giştî ji diyalogê pêk tê û ev jî şeweyekî dîtir e di vegotina çîroka nûjen de. Û her wekî em dizanin, diyalogên ku bi taybetî di vegotina çîrokî de tîn bikaranîn, çîrokê bêtir nêzikî jiyana rojane dikin ku têkiliyên di vegotinê de zindîtir dikin.

**b) Qonaxa berî salên 1980'yî û sirgûn û vederbûna li Ewrûpayê:** Di vê qonaxê de, berî salên heştêyî (bi taybetî li bakur) livdariyeke hêjayî gotinê nîn e di warê nivîsandina Kurdî de. Bes mirov dikare qala Kovara Tîrêj'e bike ku

Rojen Barnas bi navê xwe ên Rojen Barnas û Filît Totanî çîrokin nivîsandine.

Her wiha, piştî salên 1984'an Kurdên ku koç û sirgûnî Ewrûpayê bûn, li wir ketin hewldaneke ji bo teqldayîna ziman û tore û vegotina Kurdî. Û ji bo berdewamiya zimên û windanebûna dirûvê ku nifşê Hawarê dabû zimên, tekst û vegotin û berhemên hejariyê gotinê derçûn.

### Ji romana **Labîrenta Cinan (Hesenê Metê)**

Destekî Nêrgîsa koçer li se zîkê wê û yê din di ber de li ba dibe, dadikeve nava gund, li nêzikî ber deriyê hewşa mala Xanê bêhna gêrmîyeke meyrîn xwe li pozê wê dide der, di ser piyê hewşê re Xanê çav li wê dikeve ji rasta hewşa mezin ji ber beroşa gêrmîyê bi pişîrîn ber bi derê hewşê diçe... (Metê, 2000)

Ku em parîkî di jî bi xurtî û çavtûjî dêhna xwe bidin vê hevoka ku ji parçeyêke romanê ye, em ê bibînin ku hevokêke ji pênc rêzikan pêk hatî li ber me ye. Û em dêhna xwe hinekî di jî li ser hevokê eware bikin, em ê rastî 'dem û zimên' bîn. Lewre jî, li vir têkiliya xurt a dem û hêmanên zimên derdikeve pêş me. Hevok bi temamî bi dema niha (û fireh) hatiye nivîsandin. Û helbet vegotin gelek sade û rewan e, ji kurmanciya reş e û; ku ev vegotin di çîrokeke gelêrî de pêk bihata, dê kêmtirîn ji heşt hevokan pêk bihata. (Bi şêweya vegotina çîroka gelêrî: *Destekî Nêrgîsa koçer li se zîkê wê ye. Ê din di ber de ba dibe. Ew dadikeve nava gund. Nêzîkî ber deriyê hewşa mala Xanê dibe. Bêhna gêrmîyeke meyrîn tê pozê wê. Xanê li hewşê ye. Çav dikeviyê. Ji ber beroşa gêrmîyê bi pişîrîn ber bi derê hewşê diçe...*)

**c) Qonaxa piştî salên 1990'î û Nifşê Rewşenê:** Di destpêka salên 1990'î de parîkî be jî li bakur pêşiya zimanê Kurdî ji qedexekirinê vebû, Kurdên xwenda û xwîner ku paşxaneya wan a xwendinê a cihanî têr û tekûz bû, bi derçûna Kovara Rewşenê, dest pê kir, gav bi gav, li ser nexş û nîgarên zimanê Kurdî ên heta wê hingê heyî, kirasekî dîtir ê gulgulî û belekî û ji nexşên pirreng û pircure pêkhatî li zimanê Kurdî birîn; û vê kiraslêbirîna heta destpêka salên 2000'î domand.

Nivîskarên Nifşê Rewşenê û ên li dû wan, zêde li ser şêweyê zimanê axaftinê neman; wan di ser qayde û sivikî û derfetên zimanê axaftinê re, berê xwe da kitekit û hûrgiliyên gramerê û keys û derfetên ku zimên datanî ber wan, wan jî anî danî ser sifreya xwendevanan.

Nivîskarê Tirk Ahmet Hamdi Tanpınar, gava piştî nivîsandina komek helbestan, vegeyriyê ser pexşannûsî, çîroknûsî û romannûsî, li ser pirseke sedema vegeyriyê, wiha gotiye: *Di bawerîya min de, pexşanên ku bi zîmanekî ku dirûvekî dîtir û nûtir lê batine dayîn, bîn nivîsandin, dê bê bêtir karibin helbestbûn, çêj û elesa zîmên bigihînin xwîneran.*

Di vî warî de ez dikarim bêjim ku; bi taybetî Nifşê Rewşenê, hewl da ku zimên li xwe bike sedema esasî, ne ê alavî; yanê ziman bo wan wekî armanc e;

û wan ne ji bo ku çîrok û bûyerê bînin zimên, an jî ne ji bo ku bi hin bûyerên dîdaktîk mesajin bidin xwendevanan, lê belê wan jî bo zimên nivîsand û dinivîsin.

Niştê Rewşenê û nivîskarên ku di van salên dawiyê de berhemîn li pirtûkxaneyê Kurdî kirin xelat, di çîrok û roman û pexşanên xwe de, digel şêwe û dirûvê nivîsarê, rengêkî dîtir û nûtir da zimên: wan, berî her tiştî hewl da ku zimanê Kurdî bikin “zimanê ku pê tê fikirin û hestpêkirin”; û wan di her warî de hewl da ku Kurdî bi pirrengî bi kar bînin; wan, ziman bi awayekî metaforîk bi kar anî; di warê watenasiyê de jî, rengêkî nû dan peyvan; wan peyvên ku di nav gel de bi awayekî gotinkî, axaftinî û bi wateyên dîtir û mecazî dihatin bikaranîn, di berhem û nivîsarên xwe de bi kar anî; û bûn sedem ku, bêyî ku hewcetî bi peyv û watebariya peyvên zimanên di, ên biyan, bê dîtir, ziman jî hundirê xwe ve kirasê xwe li xwe bifesilîne û bend û sînor li xwe firehtir bike.

Her wiha, wan di nav hevokên xwe yê pexşan, çîrok û nivîsaran de, bêyî ku ziman jî mantiq û qalibên xwe dîr bikeve, bi pêlîstina hevokaziya zimên, asoyeke dîtir li pêş derbiranên cuda û pirreng vekirin. Û kirin ku hêviya ku jî paşeroja zimanê Kurdî tê kirin, geştir û xurttir be; û li Kurdî bûn piştevan û berevan ku Kurdî bi berhemên xwe biwêre û karibe têkeve nav qada berhemên wêjeya cîhanê ku girtina kapên ku tê de tîr avêtin cegerpolayî û çargurçikî ye.

### Ji çîroka Giriyê li Midbexê

**Dayê, çima canê te bûye kund? Kund? Û nebûye kevok an çivîk?** Min tim li wateya her du daran dipirsî û wateya ku tu bibî birayê kesine ku jî bilî xwe tu tiştî nas nakin. Kê gotiye xwîn nabe av? Kî ye xwediyê vê derewa mezin? (Yûsiv, 2003)

### Ji çîroka Belqîtîna Platonîk a Bêwexto

Tu rabî jînenîgariya hemû tîr û rim û şûran vekolî, tu yê fêr bikî ku heta bi niha birîneke wenî kûr di sînga zilamekî de venekirine. Xwezî niha min bikaribûya werîsê van gotinên caris bi hev ve girê bida û hûn berdana binê bîra birînê. Ez kaneke comerd im, nêr û elem her ber bi deşt û newalên nenas ve diherike. **Berazan hinavê jinê ji xwe re kirine garaneke ji rimilkê û simên mêraniya xwe tê de diceribîn.** Nizanim ziravê pîreboka min a platonîk li simên kîjan berazî geriyaye? (Baqî, 2005)

### Ji romana Kitim

**Dem ne zaroka berê ye.** Demê rê û rêçikên xortaniyê jî derbas kiriye. Niha dem di pêpelûka payiza emir re dadikeve ser zivistana emir. Daxwaza me jî ewil de azadî bû û hê jî azadî ye. **Her dihere dem genî dibe, daxwaz genî dibe û azadiya ku ji hezar salan e em li bendê ne jî genî dibe.** Êdî ne sebra me û ne jî emrê me têrê dike. Bes emrê me êdî bûye bîra êş û keseran. Va ye Newrozeke din tê. (Tilermenî, 2005)

## Ji çîroka Çilkên Pênûsê

**Jîniya ku ji her tiştî zêdetir nêzikî zarok e û tim û tim di hundirê xwe de dihewe...** Zaroktiya ku bi çilkeke xwîna tovîn re, difûre û diçe; çîçikên ku wekî bûtikên fêkiya tehmxeş serî didin. Xamatiya ku şerma hundirîn zêde dike, bi bizdokî û bi dilekî xişûş gav davêje nav war û qada jîniyê... **Destpêka janên gewdeyî...** Şhweta ku tevna xwe li can û bedenê dihene... Îxaneta bedenê ya li xwe... **Ezmûna bivê nevê ya ruh û giyanê...** Êrişên ajalane... Û fêkiyên mirovane... (Zeraq, 2009)

### Çavkanî

- Amîda, Îrfan. 2005. *Şopa Neşûştî*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Antolojiya Dengbêjan a Şaredariya Mezin a Amedê*, 2007.
- Arî, Arjen. 2002. *Ev çiya rûspî ne*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Baqî, H. Kovan. 2005. *Çîroka Çîrokan*. Stenbol: Weşanên Bajar.
- Barnas, Rojen. 2002. *Şî'r*. Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Bedirxan, Kamuran Ali. 2007. *Eyloyê Pîr*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Bedirxan, Celadet Âlî. 2007. *Gazîncax Xaçera Min*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Bereh, Berken. 2006. *Pandomîm*. Stenbol: Weşanên Belkî.
- Cegerxwîn. 2006. *Dîwan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Cegerxwîn. 2007. *Reşoyê Darê*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Cizîrî, Melayê. 1992. *Dîwan*. amadekar Z. Abîdîn Zinar, İstanbul: Fîrat Yayınları.
- Can, Qedri. 2007. *Guneb*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.

- Hawar. 1998. Stockholm: Weşanên Nûdem.
- Huseynî, Ehmedê. 2002. *Dîwan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Îşler, Sinem. 1998. *Çirokên Gelêrî*. Stenbol: Weşanên Enstituya Stenbolê.
- Kurd, Reşidê. 1995. *Ez*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Laleş, Lal. 2009. *Deqên Qesas*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Metê, Hesenê. 2000. *Labîrenta Cinan*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Nemir, Kawa. 2006. *Bîşenga Deştê Dûr*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Sadinî, Xalid. 2009. *Feqîyê Teyran, Jîyan, Berhem û Helbestên wî*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Tilermenî, Yaqob. 2005. *Kitim*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Xanî, Ehmedê. 2008. *Hemû Berhem*. Diyarbekir: Weşanên Lîs, çapa 1.
- Xanî, Ehmedê. 2008. *Mem û Zîn*, Bi Kurdiya Îro. Amadekar Jan Dost, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Yûsiv, Helîm. 2003. *Memê Bê Zîn*. Stenbol: Weşanên Avesta.
- Zaza, Nuredîn. 2007. *Gulê*. Diyarbekir. Weşanên Lîs.
- Zeraq, Dilawer. 2009. *Çilkên Pênûsê*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.